


Demokrasî û dîktatorî

Demokrasî - Bi hev re biryar dayîn

Demokrasi, wekî birêveberiya gel tê binavkirin, gotineke ku ji bo şiklê hukûmetê tê bikaranîn ku derfetê dide mirovan di biryarên girîng da beşdar bibin. Gel bi dengê xwe dikare bandorê li hilbijartinê bike. Demokrasî xwe ji şiklên din ên hukumkirinê cuda dike, mîna diktatorîyê, ku yek mirov biryarê dide. Şiklê birêvebirina hikûmetê ya li Norwêcê bi demokrasîyê ye. Ev wê derfetê dide mirovan ku beşdar bibin û biryarê bidin ka civak dê çawa be. Di mijarên ku zarok û ciwanan eleqedar dikê de, divê ew xwedî mafê axaftinê bin û li wan werê guhdarîkirin.

Demokrasi ji du peyvan pêk tê “demos” ku wateya wê mirov û ji “kratein” ku tê wateya rêverbirî an jî hukumdarî. Fikra reveberiya gel nêzî 2500 sal berê li Atînayê derkete holê. Li Norwecê gelek partiyên sîyasî ku li ser çawa civak bê birevebirin de xwedî fikrên cuda hene. Dema hilbijartinên parlamentoyê çêdibin, hemwelatîyên norwecê yê jor 18 salî dikarin dengê xwe bidin partiya ku nezî xwe dibînin.




Illustrasjon: Adobe Stock Mst3r.

Azadîya ramanê

Di demokrasîyekê da azadîya ramanê (îfadekirin) heye. Anku herkes bêyî ku were cezakirin dikare fikra xwe bêje yan jî binivîse. Ji temenê biçûk û pê da em hîn dibin ku hestên xwe, fikrên xwe û ramanên xwe bînin ziman. Di heman demê da girîng e ku rêzgirtin li hemberî mirovên din yê xwedî fikrên cuda hebe. Her ku tu mezin dibî, divê fikrên te zêdetir li ber çavan werin girtin.

Demokrasî - çapemenîya azad

Di demokrasîyekê da, çapemenî ji bo ku fikrên cuda werin ragihandin tê bikaranîn. Partiyên siyasî yên li Norwecê çapemenîyê bikar tînin da ku dengê xwe bigihînin gel, bi taybetî berî hilbijartinê. Di televîzyon, rojname, radyo û internetê da em dikarin li ser nîqaşa sîyatsetmedaran a ku divê civak çawa bê birevebirin bişopînin.



Illustrasjon: Adobe Stock MicroOne.

Diktatorî – kê m kes bi rêve dibin

Li hin welatan bi navê dîktatorîyê pergaleke birêvebirinê heye. Di dîktatorîyekê da tene mafê kesek, yan jî kê m kesan heye, ku biryara birêvebirina welatekî bidin. Dijfikirîna li hember revebirên welat qedexe ye. Kesên ku rexneyekê li dijî rayedaran bejin an jî binivîsin tên şopandin an jî girtin. Hin ji wan jî bo ramanên xwe tên kuştin.

Asayîye ku cudahî di navbera cureyên dîktatoriyê de bê kirin. Li gor rêveber çend kes in an jî kî ne û azadî çiqas kê m e, hinek cure dîktatorî hene:

- Desthilatdarî heke di destê yek kesî da be, em dikarin qala dîktatorî yan jî otokrasîya yek kesî bikin, wek mînak li Almaniyê Adolf Hîtler, li Yekîtiya Sovyetan Josef Stalîn, li Îspaniyê Francisko Franco.
- Heke hêz di bin destê kê m kesan da be, weke gelek welatên ku ji hela cûntayên leşkerî yan jî yek partîyê ve tên birêvebirin, em dîkarin qala dîktatorîya hembîşeyîyê an jî olîgarşîyê bikin.

Dîktatorî - bes dengêk divî bê bihîstin

Li welatên ku dîktatorî heye, desthilatdar xwedîyên amûrên ragihandina çapemenîyê ne, yan jî wan amûrên ragihandinê kontrol dikin. Rojname, radyo û televîzyon tenê karin tiştên ku desthilatdar bixwazin gel bibihîze dibêjin. Destûra axaftinê û nivîstandinê qedexeye. Ji kontrola ku desthilatdar li ser axaftin û nivîsandinê dikin re, sansûr tê gotin.